Alan DILPAK

# Gencîneya Peyvan 2




Pirtûka hîndariyan ji bo fêrbûna peyvên nû û firehkirina gencîneya gotinan, bi wêne, xaçepirs û rahênên cûrbecûr.

# Pêşgotin

Hevala mamosta, hevalê mamoste,

We ev daringa (matêriyalê) fêrbûnê pejirand. Lê ez dixwezim ji bo we, bi kurtahî, bikaranîna wê zelal bikim.

Ev daring baş bi kêrî gencîneya gotinên kurdî yên bingehîn tê. Şagirt her 12 gotinan, li gor nîşanên diyarkirî, nas dike û fêr dibe.

Baldan (konsêntrasiyon), daxwez û bilezbûna şagirtan bi zîrekî û têgihîştina wan ve girêdayî ye. Lewma pêwîstiya van şagirtan bi zaf balkêşî û yarmetiya (alîkarî) pêdagogan heye. Ev daxwezî li ser me pir giran e. Ev daring dibe alîkarî û asanî ji bo amadekirineke çalak û ew gengaziyeke (îmkan, rêdan) cudayî pêşkêş dike.

Me bi pêkanîna hin nîşanan xwestiye, ku hînbûn bi vê pirtûkê hên asantir bibe. Pirtûk ji aliyê şêwe (mêtod) ve wisa hatiye danîn, ku xwendevan bikanibe serbixwe kar bike.




Ji bo mirov baş tê bigihîne û rast binivîsîne, hin rahên (hîndarî) û xaçepirs jî hatine amadekirin. Hin kaxezên rahênan, wek nimre (5 û 6) bi du radeyên dijwariyê hatine danîn. Wek alîkarî du nîşanên dijwariyê, giran û sivik, hatine diyarkirin. Loma, ji bo her 12 peyvan, bilî kaxezên rahênan yên diyarkirî, heft kaxezên rahênan ji bo fêrbûnê jî hene. Bi rêya alîkariyên diyarkirî, mirov dikane kaxezên rahênan yên din jî ji bo radeyên dijwariyê yên cuda bi kar bîne.

Kaxezên rahênan, yên beşekî serbixwe dikanin li dû hev yan bi awayekî bijarte, yekser yan jî her dema ku mirov bixweze, tên bikaranîn.

Hûn dikanin kaxezên rahênan bi xwe nimre bikin û wan li cih û dema hûn bixwezin pêkbînin. Şagirtên we bila hejmara rûpelên rahênan bi xwe dagrin.

Gengaziyên bikaranînê him di warê zimanê kurdî de (avakirina gencîneya gotinan, rastnivîs û xwendin) û him jî di warê waneyên (ders) tiştan de dibin.

Mîna ku tê zanîn, hin gotin li hin cihan bi awayên cûrbecûr bi lêv dibin. Ji bo vê yekê, hemû navên wêneyên ku di rahênan de derbas dibin, ew wek ferhengok di dawiya pirtûkê de hatiye çapkirin. Daku di xebatê de yeksanî û ne tevlihevî çê bibe, divêt pêdagog vê ferhengokê bike bingeh û li gor wê biçe.

Nişandeka  ku li jêrî rûpelan hatiye danîn, ji bo xwendevan û pêdagogan e.

Ezê pir kêfxweş bibim, heke hûn min li ser pêşniyaz, daxwez û rexneyên xwe agahdar bikin. Ezê hewil bidim, daringê li gor daxwezên we sererast bikim.

Ez ji xwendevanan re hînbûneke dilxweş dixwezim!

Alan DILPAK

# FERHENGOK

| Kurmancî : | *Gotinên hevmane :* | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| **baçermok** | *baçermik, balçermek, balçimk, barçêmik, çekçekûle, çil, çilê çilê, çîlî çîlî, dûvmesas, perçemok, perçîmek, pîrçemek, şevrevînk, şevşevik, şevşevok, şilika şevê* | **şevşevik, şevşevok** | şemşemekore |
| **baldan** | *konsentrasiyon* | **konsantrasyon** | serinc |
| **balîfê mêr** | *balîfê maran, êskargo, hêlkeyî (...........), pelisank, qalqalok, qepûşk, (...........)* | **(...........)** | qalqalok |
| **başûke** | *baleban, başîk, başok, bazik, miqesok* | **arpejik** | başûke |
| **baz** | *balaban, baleban, bazî, eloh, şabaz, şahbaz, şahîn* | **baz/e** | baz |
| **beq** | *aqroq, baq, boq, , buk, buq* | **beqe, beqi** | boq |
| **beran** | *şek* | **baran, beran, vosn, vons** | beran |
| **beraz** | *baraz, bore, dengî, xinzîr, xiznîr* | **xonz/e, xoz/e** | beraz |
| **berx** | *berdîl, berix, berxik,* | **varek/e, varek/e** | berx |
| **bilbil** | *endelî, şevxûnk, tûteber* | **bilbil/e, bulbul/e** | şalûr, şalil |
| **bizin** | *gûskêza* | **bize, bizi** | bizin |
| **canberî** | *keçî derya, kêvcaloşk, qirjal* | **--------** | -------- |
| **canî** | *cehnî, cenû, ciwanî, conî, cuwan, cuwanî* | **cana, cane, canî, cuyane** | ciwanû |
| **cehşik** | *cehişk, kurik, kurî, kurîn, sîpe, sîpik* | **canşik/e, kurî, kurri** | caşik |
| **cewrik** | *bûcî, cewrîk, cêwrik, çêjik, dihêlk, fênik, gucîle, kudik, kudî, kûdik, têjik, tol, tole, tûle, tûtik* | **bocî, cewrik** | gucîle, tûtik |
| **çalak** | *bizav, faal* | **çalak** | hoşmend, wirye, zirîng |
| **çeqel** | *çeqal, çexel, şeqal, torî, torîk, turî, tûrg, wawîk* | **çeqal/e, çeqel/e, çeqqal/e** | çeqel |
| **çêlek** | *çêl, manga, mange* | **manga** | çêl |
| **çêlik** | *cûcelok, cûcik, çêçik, çîçelok, çîçik, çûçik,* | **çêlik/e** | çêl |
| **çûçik** | *balinde, beytik, çivîk, çiwîk, çîçîk, çûk, firinda, perinde, quncîsk, sevanok, şivandîlke, terewil, teyr, têr* | **çûçik/e** | balinde, mel |

| Kurmancî : | *Gotinên hevmane :* | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| **daring** | *ambûrîn, bûjen, çinyat, hacet, haşîya, malzeme, materiyal* | **hacet** | amraz, keriste |
| **delfîn** | *berazî derya, dêlfîn, dilfîn, hûtik, yonîs, xinzirê behrê* | **delfîn** | delfîn |
| **dersdar** | *fêrkar, hîndar, mamoste, pedagog* | **malim, mûsnedar** | mamoste |
| **dibistan** | *dersxane, fêrgeh, hîngeh, mekteb, xwendegeh, zaniştgeh* | **mekteb, mektev** | dibistan |
| **dîk** | *dîkel, keleba, kelebab, keleşêr, şêrik* | **dîk** | kelebab, keleşêr |
| **dûpişk** | *dîpişk, dumarekol, dupişk, dupûçik, eqreb, tupîşk* | **di(l)pistike** | dûpişk |
| **elok** | *alok, coqcoq, cûrcûr, elo, kûrkurê (bûqelemûnê) mê, mirîşka şamê, şamî, qelemon, qilît* | **çulux, dîkê misirî** | elîşîş, qelemûn |
| **fêrdar** | *dersdar, hîndar, mamoste, pedagog* | **malim, mûsnedar** | mamoste |
| **fêrgeh** | *dersxane, dibistan, hîngeh, mekteb, xwendegeh, zaniştgeh* | **mekteb, mektev** | dibistan |
| **fîl** | *devlok* | **fîl** | fîl |
| **ga** | *nêraga* | **ga** | ga |
| **gakovî** | *gakûf, gakûvî* | **gakûyî** | gaçêwî |
| **gamêş** | *camûs, kelgamês* | **gamêş** | gamêş |
| **gencîne** | *xezîne, xezne* | **xezîna, xezna** | gencîne |
| **gengazî** | *desthatî, îmkan, mecal, rêdan* | **îmkan** | îmkan |
| **gêrik** | *gêle, gêre, gîrik, mêrû, mîro, mojle, moristang, morî, mûr, mûrî* | **miloçike** | mêrûle |
| **golik** | *gulk, mozik, paronek* | **golik/e** | golik |
| **gur** | *gurg, verg* | **varg, verg** | gurg |
| **hechecik** | *çoleke, dîlmiqesk, dûmeqesk, dûvmexesk, hecheçoq, hecîreşk, hed-hedik, peresêlke, pîlsteng, qerneqûçik* | **hechecik/e, hachacik/e** | hechecoq, peresêlke, pîlsteng |
| **heftar** | *heftiyar, keftar, kemtiyar* | **heftar, xeftar** | kemtiyar |
| **hephêpik** | *dawûdîdunîkil, dîksilêman, hudhud, kûkê dumdum, pepûka fisek, pepûka kilik, pepûka Silêman, teyrikê dunikil* | **dîksilêman** | pepûsulêmanke |
| **hesp** | *esp, hasp* | **astor/e, ortor/e** | esp |

| Kurmancî : | *Gotinên hevmane :* | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| **hespê behrê** | ---------- | **astorbahr, astorê bahrî** | espê behri |
| **hespê nîl** | *espê avî, hespa Memê Alan, hespê berî, hespê avê, hespî avî, mahîna avînijdebaran, mehîna avî* | **astorê nîlî** | hespê avî |
| **heştpê** | *ahtapot, axtapot, merê (rewirê) heîştling (heîştpenc)* | **heşt (heyş) herme** | seretan |
| **hewil dan** | *cehd kirin, zef xwestin* | **cad kerdene** | koşiş kirin |
| **heywan** | *teba, lawir* | **heywan** | giyanleber, heywan |
| **hêstir** | *dundul, estir, êstir, hestêr, hestîr, qantir, qatir* | **qantir/e** | êstir |
| **hêştir** | *deve, devîh, hêcin* | **deva, deve** | huştir, wiştir |
| **hêştirmel** | *heçtirmel, serperîzk* | -------- | wiştirmir |
| **hirç** | *hurç* | **hes/e, heş/e** | wirç |
| **hirçê cemserê** | *hirçê şimalî, hirçê xûzkê, hirçî sehol-bend* | **heşê cemedî, heşo spî** | wirçê sipî |
| **hîndar** | *dersdar, fêrdar, mamoste, pedagog* | **malim, mûsnedar** | mamoste |
| **hîndarî** | *berhevî, hewer, hînker, rahên* | -------- | meşk, rahên |
| **hîner** | *ders, wane* | **ders/e** | wane |
| **hîngeh** | *dibistan, fêrgeh, mekteb, xwendegeh* | **mekteb, mektev, nusnegah** | dibistan |
| **hulî** | *baz, burgut, dal, daraşwirxal, eylo, helo, qertel, teîr* | **eylo** | helo |
| **jûjî** | *jivjî, jîjîk, jîjo, jojî, jûjû, sîxur* | **dûje, jûje** | jûjik |
| **kar** | *gidîk, karik, kehr* | **bizek/e, bizêk/e** | kar |
| **kengerû** | *kangaro, kangrû, kêngûrû* | -------- | kunxur |
| **ker** | *caş, cehş, godrêj, guhdrêj, gureş, merkeb* | **her/e** | ker |
| **kerguh** | *keroşk, kewoşk, kêrîşk, kêroşk, kêrwişk, kêvroşk, kewrîşk, kewrûşk, kêwrûşk, kîroşk, kîvroşk* | **awrêş, harguş** | kerwêşk |
| **kerkedan** | *gaê yeksture, kerqedan* | **gergedan** | kerkeden |
| **kevjal** | *kevjing, kevjnîk, kêfşing, kêvjale, req* | **çarpencike** | kirjal |
| **kevok** | *kevotar, kevotk, kevuk, koter, tivirk, tivîrg* | **gorgeçîne** | kotir |
| **kew** | *qarîtk, kebk* | **zaranc/e, zaranz/e,** | kew |

| Kurmancî : | Gotinên hevmane : | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| | | zerenc/e | |
| kêzik | *bihok, buhuk, buxik, gîgiwêrk, kêzekesk, kêzûk, mêrû, mixmixk, sic, zêndî* | lûlik | qaloçe |
| kormişk | *cibrok, curc, curt, koremişk, kosnîg, kremişk, mişkê kor, stevlok, xiltê kor, xîlt* | koremişk, kurmuşik | cûrc |
| kulî | *hespê gîhê, kulisink, kulleh, kulo, kûlî, melex, sûsirk* | kulî | kilo, kule |
| kund | *bûm, kind, kundelo, pûm, şût, tot* | bum/e, pû, pûyo kor | kundebebo, pepo |
| kurbeşik | *çaleke, kurbeş, kuribeşk, kurbeşîk, kurbeşk, kurebeşk, parsûk, qurbeşe, qurbeşk* | kurbişik | kurebeşe |
| kurik | *cehişk, cehşik, kurî, kurîn, sîpe, sîpik* | canşik/e, kurî, kurri | caşik |
| kurm | *kirm, maşot, temtîr, tertûl, turtûr* | kerm, tentûr | kirim |
| kutkutik | *darkirok, darkol, darkunkere, darkutîk, darkûke, kankûrk, kutkutok, terewilê darqul* | kutkutik | darkunkere |
| kûçik | *kelp, kûtî, sa, se, seg* | kutik/e | seg |
| kûsî | *kêsîle, kîsel, kîsele, kîso, kûsel, kûsele, kûselok, kwêsî, kwîsî, şkêvlatok* | kesik, kûsî | kîsel, reqe |
| lama | *mîgir* | lama | lama |
| legleg | *hacîleqleq, leqleq* | legleg, leyleg | hacîleqleq |
| malûlk | *kurm, lûlik, malik, malîlk, marik, tîzmar* | lûlik | kirim |
| mamoste | *dersdar, fêrdar, hîndar, pedagog* | malim, mûsnedar | mamoste |
| mar | *mer* | mar, mor | mar |
| margîse | *bokelemûn, bûkelemûn, durû, kemkema, kerpêe, pîra mîlikdas, pîrka melekdas, têrtêre, xemegurî* | bûkelemûn | marmilok |
| marmasî | *cûmasî, mermesî, mesîyê dirêj* | masêmar, masê marî | marmasî |
| masî | *mesî* | mase, mosa, mose | masî |
| masîgir | *leylekê masya, şîrînşaho, quling* | masîgurete | masîgire |
| masîhût | *balîna, hûf, hût, neheng, nehing* | -------- | neheng |
| masîlok | *fok, golkê avê, gulka avî, pişîka avî, sekê behrê* | kutikê behre | segaw, cile |

| Kurmancî : | Gotinên hevmane : | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| **masîpan** | *masîkartûxk, tilpank* | **masêpan, masêpon** | tilpank |
| **masîşûr** | *masyê şûr, serşûrmasî* | **maseşîmşêr** | şûrmasî |
| **meymûn** | *sehdan, şemo, maymun, meymînk, mêîmûn* | **meymun/e** | meymûn |
| **mêş** | *hûrmêş, vizik* | **mêşe** | mêş |
| **mêşa hingiv** | *heng, mêşa hingivî, mêsa hingvînî, mêşa hingwîn, moza hingiv* | **mêşa hemgênî** | meşengiwîn |
| **mirîşk** | *mir, mirwîşk, tûtik* | **kerge** | mamir, mirîşk |
| **mişk** | *mîşk* | **mere, merre** | mişk |
| **mî** | *mêşin, mih* | **mîye** | mer |
| **moz** | *korox, pêlesor, pîzag, pîzalok, pîzang, sêmsor, stang, şanezerk, zirgêtik, zirgêtk* | **moze** | zengesûre |
| **mozega** | *kelmêş, kermêş, korox, mêşa dewêr, mêşa keran, mêşik, mozeyê keran, pîzang* | **mozegameşan, mozegameşe** | mozeşine |
| **nêrî** | *gîsk, teke* | **nêrî, kel** | nêrî |
| **ordeg** | *miravî, sone, sûna, werdek, xarxarîk* | **ordeg/e, werdeg/e** | miravî, sone |
| **panter** | *piling, pilinga çîn* | **panter** | panter |
| **pelîkan** | *dêmkefçik, keravî, xotan* | **pelîkan** | pelîkan |
| **pepûk** | *kûkû, pepok* | **pepûg, pepûng, pepûk** | pepû |
| **pepûle** | *aşfatik, balatîf, belbelîtanik, belbelîtank, beletîtk, belîtang, bilbilîtanik, firfirok, minminîk, nimnimî, peletîvk, pelpelîsk, pepîle, perperok, perwane, pirpirk, pirpirok, pirpîrek, pîrik, pletînk* | **perperik, pirpirik** | perwane |
| **peyv** | *bêje, çekû, gotin, kelîme, şor, wuşa* | **çekûye** | wişa |
| **pezkovî** | *bizina yawanî, fîlegêj* | -------- | bizneçêwî |
| **piling** | *babir, peling* | **piling** | pilîng |
| **pilingê pinpinî** | *jaguar, jagvar* | -------- | pilingê belek |
| **pising** | *dihlik, kêtik, kitik, pisik, pisink, pisîk* | **pising/e** | pişîle |
| **pisîk** | *dihlik, kêtik, kitik, pisik, pising,pisink* | **pising/e** | pişîle |
| **pîngwîn** | *pêguen, pêngwên, pêngwîn, pîngiwîn* | -------- | pengwîn |
| | *bilo, calcaloke, cacalok, dapîrojk,* | | |

| Kurmancî : | Gotinên hevmane : | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
| --- | --- | --- | --- |
| **pîrik** | *kevnî, pênpênûşk, pêpênuşik, pilindir, pindepîr, pîravok, tevinpîrk, tevnepîr* | **pîrike** | calcaloke |
| **pîşemasî** | *keştî portexalî, mêdûz, pişemasî, xendûs* | -------- | -------- |
| **pol** | *klase, sinif* | **sinifi** | pol |
| **qalqalok** | *balîfê maran, balîfê mêr, êskargo, hêlkeyî (...........), pelisank, qepûşk, (...........)* | **(...........)** | qalqalok |
| **qaqlîbaz** | *kakilî bazan, terewila mesîxwur, sînik, tîtilkinaçe* | -------- | masîxwur |
| **qaz** | *bet* | **qaz, qaze, qazi** | qaz |
| **qijik** | *kerejûk, qelabaçke, qelebask, qele-başk, qeşqel, zaq* | **qijike** | -------- |
| **qirik** | *çûçereş, kel, qaj, qankereş, qaqîj, qir, xurab* | **qelancike, qilancike, qilanciki** | rîşole |
| **quling** | *qurîng, sîquling* | **quling/e** | quling |
| **qumqumok** | *bîkmar, bûkacûya, bûkemar, bûkmar, dîlmar, fatfatik, fatfatok, fatik, gimgimok, gumgumok, hulîskemar, kelpezî, kêlbik, marecok, marmarok, marmaroşk, marmêlke, mengîsk, qumqume, qumqumuk* | **gumgumiki, qumqumik** | qumqumok |
| **qumrî** | *fatfatik, fatmuk, kevot, koter, kotir* | **qumrî** | qumrî |
| **rade** | *derece, gradûs, miqam, niqir, pêling, pîle* | **dereca** | pile |
| **rahên** | *berhevî, hewer, hîndarî, hînker* | -------- | rahên |
| **rovî** | *rêvî, rûvî* | **lue, luwî, luy, lû, lûe, lûwî, lûye, rûye** | rîwî |
| **sarpêhatî** | *deniş, ceribandin, ceribok, serborî, serhatî, taqi, tecribe* | **tecrûbe** | îmkan, tiwanî |
| **segavî** | *darbir, kûçikê avê, saavî, segî avê, segî avî, semasî, xindî* | -------- | cile, segaw |
| **semasî** | *hûtê berê, kûçikmesî, kûtiyê avî* | **masekutik, masê kutikî** | semasî |
| **semorik** | *çekeloz, pilûr, sencab, simolek, sior, sivore, siwûrî* | **simolek** | simbore |
| **sîsolek** | *keçelok, kergê, kerxur, kurt, kurtekelaşe, sîmex, sîqalk, sîqalqa* | **laşewer, leşewer, leaşwer** | sisark |
|  | *gurî, simsyar, sîmerx, sîmswark, sin-* |  |  |

| Kurmancî : | Gotinên hevmane : | Kirmancî / Dimilkî : | Soranî : |
|---|---|---|---|
| **sorewîlk** | *siyarik, sîsalik, sîsarik, sîsark flamîngo, sonevîrk* | **filemîngo** | filemîngo |
| **şêr** | *xezenfer* | **aslan, şêr** | şêr |
| **şêwe** | *azîn, metod, rêbaz, rêzik, şêwaz* | **metod** | şêwe |
| **şivir** | *ask, mambiz, maral, gakûvî, pazkovî* | **--------** | kel, şûr |
| **tajî** | *tazî, tejî* | **tajî** | tajî |
| **tawîs** | *tawis, tawus, tawûs* | **tawis** | tawîs |
| **teba** | *heywan, lawir* | **heywan** | giyanleber, heywan |
| **tîmsah** | *cile, gimgimokê avê, krokodîl, sûsmar, timsax* | **tîmsah** | tîmsah |
| **tukan** | *----------* | **tukan** | tukan |
| **tûtî** | *bêbêmeto, bîbîmeto, dewdew, papagan, totî* | **papaxan** | tûtî |
| **tûtîevîn** | *dewdew* | **--------** | çuçika vîyane |
| **wane** | *ders, hîner* | **ders/e** | ders |
| **weşek** | *gorewîlk, gornebaş, kîtka asê, kîtka kûvî, pisgê kûvî, pîşîka kûvî, werşek, weşak* | **--------** | gorewilk |
| **xalxalok** | *kêzika biharê, kêzmaxatûn, sosik, sosin* | **xalofir** | xalxalok |
| **xezal** | *ahû, bizina kûvî, hevorî, hevûrî, şûl* | **xezale, xezali** | mamiz, asik |
| **xwendegah** | *dibistan* | **mekteb** | dibistan |
| **zebra** | *kerê kîvî, kerê ravrav, kerê şehnik, kerê tîxdar* | **zebra** | kerî wehşî |
| **zerafe** | *canhêştir, canêdeve, devîşk, jîraf, zîraf, zurafa, zûraf* | **zurafa** | zerafe |
| **zerîle** | *beîtik, kenarî, qenarî, zerbav, zerwêla* | **kanarya** | kenarî |

## Çavkanî


1. D. Îzoli
   Ferheng
   Kurdi-Tırki / Tırki-Kurdi
   Weşanên Deng, İstanbul-1992, ISBN: 3-927213-04-7

2. Feryad Fazil Omar
   Kurdisch-deutsches Wörterbuch
   Ferhenga Kurdî-Elmanî
   Kurdische Studien, Berlin-1992
   Verlag für Wissenschaft und Bildung
   ISBN: 3-927408-45-x

3. Joyce Blau
   Dictionnaire Kurde
   Publications du Centre pour l´Étude des Problèmes
   du Monde Musulman
   Contemporain 4, rue de Pascale, Bruxelles 4, 1965

4. Torî
   Ferheng
   Kurdî-Tirkî / Türkçe-Kürtçe
   Koral, İstanbul-1992, ISBN: 975-7780-16-2

5. Ali Seydo - Ali Gewranî
   Ferhenga Kurdî Nûjen
   Kurdî-Erebî, 1985

6. Musa Anter
   Ferhenga Khurdî-Tirkî
   Yeni Matbaa, İstanbul-1967


7. Malmisanıj
   Ferhengê Dımılki-Tırki
   Weşanên Deng, İstanbul-1992

8. Baran Rizgar
   Dictionary - Ferheng
   Kurdish - English / English-Kurdish
   Kurdî-İngîlîzî / İngîlîzî-Kurdî
   Lithosphere Printing Cooperative
   82/90 Queensland Road, London N7 7AW - 1993

9. prof. FARIZOV
   Ferhenga Tirkî-Kurdî
   Ankara 1994, Öz-Ge Yayınları 18
   ISBN: 975-7861-03-0

10. Amirxan
    Ferhenga Kurdî-Almanî
    Max Hueber Verlag, 1992
    D - 8045 Ismaning
    ISBN: 3-19-006349-4

11. Amirxan
    Ferhenga Almanî-Kurdî
    Max Hueber Verlag, 1992
    D - 8045 Ismaning
    ISBN: 3-19-006348-6


Tebayên avî
Tebayên binavî
Kurm û kêz
Çûçik û balinde